



# CIWANÊN ŞOREŞGER

KOVARA TEVGERA CIWANÊN ŞOREŞGER Ê SÛRIYÊ

2023 TÎRMEH/TEBAX

HEJMAR 20



“

BI RIHÊ 19 TÎRMEHÊ DÎWARÊN İMRALÎ HILWEŞÎNIN, CENGA AZADÎYÊ SERBIXIN

”



CENGA AZADÎYÊ SERBIXIN

# NAVEROK

المحتويات

- |    |  |
|----|--|
| 5  | <b>YAN ÇARESERÎYA DEMOKRATÎK YAN JÎ<br/>ŞERÊ GELÊ ŞOREŞGERÎ</b><br>RÊBER APO                             |
| 8  | <b>CIWAN WÊ DI PÊVAJOYA BÊ DE ERK Û MISYONA<br/>KU DIKEVE SER MILÊ WAN ÇAWA PÊK BÎNIN?</b><br>BAWER AGIR |
| 15 | <b>ŞEHÎD ÇEKDAR AMED</b><br>GERZAN EFRÎN   |
| 18 | <b>GIRÎNGÎYA ÇAND Û ZİMAN</b><br>EHMED HESEN   |
| 20 | <b>ROLA XWENDEKARAN DI ŞOREŞÊ DE</b><br>EMÎNE MIHEMED  |
| 22 | <b>YÊN KU XWEDÎ İDAYA JIYANA MEZIN û BI WATE</b><br>VIYAN SERHED   |
| 26 | <b>Jİ ALMANYA HEYA ÇIYAYÊN KURDISTANÊ</b><br>ŞİYAR GABAR   |

مصير الحادة الرأسمالية في الشرق الأوسط

القائد عبدالله أوجلان

٣

توجيهات المرأة الشابة

نوجان ساردوز

١٢

أحدهم مظلوم والآخر معصوم



علي جيجاك

١٥

الرياضة في شمال وشرق سوريا

بوزان بركل

٢٠



## Ragihandina Ciwan

Li hember şerê taybet,  
weke ragihandina şerê  
gelê şoreşgerî, xebatkarên  
«Ragihandina Ciwan» bi  
awayekî dîlxwaz û bê navber  
di têkoşînê de ne.

Bi nêrîn û pêşniyarên xwe  
Bi şandina berhemên xwe  
Bi buyina endamê  
«Ragihandina Ciwan» bibe  
dengê heqîqetê...

### إعلام الشبيبة

في مواجهة مع الحرب الخاصة  
كأعلام للحرب الشعب الثوري  
نشاطاء الأعلاميين  
لالأعلام الشبيبة  
يعملون بلا كلل وملل  
ولابيعرفون التعب  
دائماً موجودون بين النضال

من خلال تقديم آرائك  
واقتراحاتك عن طريق تقديم  
منتجاتك، عن طريق أن تكون  
عضو من هذا العمل  
أنت أيضاً  
ستصبح صوت الحقيقة

[ciwanensoresger.com](http://ciwanensoresger.com)

[ragihandinaciwana](#)



[t.me/Rac\\_ciwan](#)



[racciwan@gmail.com](mailto:racciwan@gmail.com)



[@Ragihandin15](#)



[RacPress2](#)



[fb.com/Racpress](#)



## RÊHEVALÊN HÊJA...

Em ji ronahiya rûpelên zanîna nûjen a kovara xwe ya bi navê Kovara Ciwanêن Şoreşger, dîsa û bi hejmareke nû, bi talîmata şerê gel ê şoreşgerî yê Rêber Apo û ronîkirina jiyana şoreşgerî, li pêşberî wene. Her wiha, derbarê ciwanê têkoşer Çekdar Amed û gelek mijarênu ku xizmeta meşa we ya netewî û şoreşgerî dîkin di nava xwe da dihewîne, em hemû hêvîdar in ku ev hejmara me di şopa şehîdên berxwedana dîrokî ya 14'ê Tîrmehê de, ji Mihemed Xeyrî Durmûş, Kemal Pîr, Ali Çîçek û Akîf Yilmaz, di çêkirina dîrokê û bidestxistina serkeftinên nûjen de, bi cesaretek ji efsaneyâ pêngava dîrokî ya 15'ê Tebaxê û rizgarkirina her pincek axa Kurdistanê û xaka Sûriyê ya dagîrkirî ji hovîtiya dewleta Türk a faşîst û dagirker û çeteyên wê yên tekfîrî û di lütkeya têkoşîna şoreşgerî de bi rihê Hêzên Rizgariya Efrînê û gerillayan, bi destxistina azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û bilindkirina ala netewa demokratîkê û biratiya gelan di asta bilind de ye û ezmanê Rojhilata Navîn a azad e.

Bi hêviyên xwe yên serkeftineke bi zafer li hember dijminên mirovahiyê, heta hejmareke din em di xizmeta we xwendevanên hêja de ne.

## RAGIHANDINA CIWANAN

Li hemberî şerê taybet, weke ragihadina şerê gelê şoreşgerî, xebatkarên «Ragihadina Ciwan» bi awayekî dilxwaz û bê navber di têkoşînê de ne.

Bi nêrîn û pêşniyarên xwe, bi şandina berhemên xwe, bi buyina endamê «Ragihadina Ciwan» bibe dengê heqîqetê...

racciwan@gmail.com



ragihadinaciwana

t.me/Rac\_ciwan



fb.com/Racpress


RacPress2



@Ragihadin15



## YAN ÇARESERÎYA DEMOKRATÎK YAN JÎ



RÊBER APO

## ŞERÊ GELÊ ŞOREŞGERÎ

Ji niha û pé ve feresata parastina cewherî ya ku wê were pêşxistin, her cure birêexistinbûna gel e, divê yekîneyê parastina cewherîn ên ku gel di nav de cih digrin, werin pêşxistin. Ya din jî dema ku ez dibêjim parastina cewherî, hertim çek tê fêmkirin. Pêdiviya civakên herî demokratîk jî bi xweparastinê heye. Ev nayê wateya çekê. Xwepêşandanêن girseya demokratîk jî şêweyeke parastina cewherî ye. Bo mînak; ger li Amedê gel bi rojan weke Misrê ji kolanan dernekeve, daxwazêن xwe bîne ziman, vaye wê demê dê aştî were. Wê demê binêrin ka dê AKP bimîne yan nemîne, vaye wê demê Erdogan bi xwe dê çareseriya vê pirsgirêkê bixwaze. Wekî din hêza wan jî heye ku bi milyonan kesî li Amedê bicivînin. Ev rîbaz jî parastineke cewherî ye. Ez li rîyêن çareseriya demokratîk û aştiyane ya pirsgirêka Kurdan digerim.

Em ji berê heyâ niha dibêjin ku dê rejîmên dîktator ên li Rojhila-ta Navîn bi sîstema Konfederalîzma Demokratîk re werin derbaskirin. Çareseriya Konfederalîzma Demokratîk, yekane çareserî ye. Ger rûyê çareseriya demokratîk bixtimin, wê demê bixwazî nexwazî dê şîdet bilind bibe, ev tesbîta rewşekê ye. Xitimandina riyê çareseriya demokratîk tê ci wateyê; tê wateya destpêkirina demeke ku digihîje heyâ qutbûnê. Em dixwazin pêşîya vê bigrin û çareseriya demokratîk pêk bînin. Hemû hewldana me ji bo vê ye.

Di vebijêrka duyem de, ger çareserî bi pêş nekeve, wê şerê gel ê şoreşgerî destpê bike. Wê demê ne 3 hezar kes, wê 300 hezar kes werin girtin. Ne 50 hezar kes, wê 500 hezar kes jiyana xwe ji dest bide. Ger şerekî wisa bi pêş bikeve, wê rewşa şer û aloziyek mezin derkeve.



AKP, nêzî çareseriyê nabe. Hikûmet, li hemberî Kurdan pir bi zal-imtî hiqûq û qanûnan dixe dewrê û hewl dide wan tasfiye bike. Ev, rewşekê pir xeter e. **Erdoğan, rewşa we ya îro dişibe rewşa Sedam a dema êrîşî Kuweytê kir.** Emerîka, ya rastir Îngilîstan çawa ku berê Sedam da Îranê û paşê jî da Kuweytê, niha jî te rîdike Lîbyayê û Sûriyeyê. Dişîne ser Kurdan. Sedam jî çû ser Kurdên xwe, bi Kurdên

xwe re şer kir. Niha jî hûn li pişta we bi hêza Emerîkayê re li hemberî Kurdan şer dikan. A rastî, ev dafikek mezin e. Ev dafik, dafikeke ku ji bo we jî hatiye danîn e. Heman wekî Sedam. Sedam xistin defikê. Ez li vir eşkere bang li we dikim. Di heman demê de ji we re nameya min a eşkere ye. Neyên vê lîstokê. Tavilê vê bi dawî bikin. Berê xwe bidin çareseriya destûra bingehîn a demokratîk.

**Ger çareseriya demokratîk bi pêş nekeve, ya dimîne şer e.  
Em ê wê demê jî, bi kêfxwesi şer bikin.**

Meşandina têkoşîna demokratîk û şoreşgerî, ne ewqas hêsan e. Me hewl da ku em heya îro vê têkoşînê bi hêjayî bi cih bînin. Divê li hemberî van polîtîkayên sextekar, têkoşîna demokratîk û şoreşgerî were bilindkirin.

Bêyi ku cudahiya jin, zar û zêc were kirin, hema bêje wekî kerîyan girtin çêdibin. Her roj li hin deveran 15-20-30 kes têr binçavkirin û girtin. Ev binçavkirin û girtinê wiha, ciwanan ji siyasetê qut dikan û berê wan didin çiyê, tevlîbûna gerîla jî zêde dikan. Yek ji van girtinan jî ne hiqûqî ye, ev bi temamî tewşiyek e. Ma wisa bi hezaran kes di bin navê endamên rêxistinek veşartî ne, têne girtin û rêxistinek

**“*Ger çareseriya demokratîk bi pêş nekeve, ya dimîne şer e. Em ê wê demê jî, bi kêfxwesi şer bikin.*”**

veşartî ya ku bi hezaran endamên wê yên sivîl hene çêdibe? Bi ser de jî, li ser yek ji van kesên ku hatine girtin çek mek jî tune ye. Berê di ser JÎTEM'ê re ev bi kuştinê dikirin, niha di ser polîsan re bi giştî digirin. Eşkereye ku AKP, bi asta jorîn a Ergenekonê re ku jê re tê gotin dewleta kûr re jî li hev kiriye. Ez di vê xalê de dixwazim bang li ciwanan jî bikim. Bila xwe wisa hêsan nedin girtin, tedbîrên xwe bistînin, wekî mîhan xwe nedin girtin. Divê ciwan di vê mijarê de xwe bi rêxistin bikin. An bila xebatan nemeşînin, an jî ger dimeşînin bila tedbîrên xwe bigirin. Bila xwe hêsan nedin girtin, ger pêwîst bike bila xwe bispêrin Gabarê. Ez vê ji bo gerîla jî dibêjim. Ger biçin ser wan û êrîş bikin, wê bi derfetên di dest xwe de qat bi qat bersivê bidin. Ev her dem wisa ye. Bi misogerî ji bo ku xwe nedin tunekirin, wê xwe bi her awayî biparêzin. Ev parastina rewa ye.



## PERSPEKTİF

*Ciwan wê di pêvajoya bê de erk û misyona ku  
dikeve ser milê wan çawa pêk bînin?*



BAWER AGIR

Me meha fedayîtiyê, meha Hezîranê derbas kir û em ketin meha tîrmehê ya ku me têde rûmeta welatparêziyê bi dest xist. Em di salvegera 41'emîn a greva mirinê de ne ya ku di 14'ê tîrmeha 1982'an de çêbûye ku bi berxwedaniyeke bê hempa pêk hat, her wiha çalakiya fedayî ya ku heval Zîlan di 30'ê Hezîrana 1996'an de pêk anî û peyama xwe ji wê berxwedana lehengî girt û vaye ev çalakiya ku heval Zîlan kiriye dikeve sale

xwe ya 28'emîn, ev çalakî ji bo me weke gel nimûne û dersên nû ne ku em jê feyde bigirin û xwe di van her du buyerên dîrokî de xurtir bikin. Em çalakiya 14'ê tîrmehê û çalakiya 30'ê hezîranê yên navdar pîroz dikin, bi boneya salvegera van her du çalakiyan em di kesayeta heval Mihemed Xeyrî Dirmuş, Kemal Pîr, Akif Yilmaz, Elî Çîçek û Zeyneb Kinacî (Zîlan) de hemû şehîdên azadiyê bi bîr tînin û bi vê boneyê em soz didin ku em ê di serkeftinê de xwe kilît bikin û heyâ



kêliya dawiyê ji jiyana xwe bi xeta şehîdan ve girêdayî bin. Ya ku di van çalakiyan de diyar dibe, rihê rastîn ê berxwedan û serkeftinê ye ya ku ew jî rihê berxwedana 14'ê tîrmehê ye, ji ber vê yekê divê em xwe zêdetir di vê bîranîna dîrokî de kûrtir bikin, ev bîranîna ku em rojane tê de fêrî serkeftinê bûn, ev rastiya berxwedana demokratîk a rojane ye ku gel û tevgera me li dijî faşîzmê pêk tîne ye, ev bîranîn di nava xwe de pir nimûne û tecrûbeyan dihewîne.

Çalakiya fedayî ya ku heval Zîlan di 30'ê Hezîrana sala 1996'an de li dijî komploya 6'ê gulanê ya ku Rêber APO armanca wê komployê bû pêk aniye ji nêzîktirîn û rastirîn helwesteke lehengî bû ji rastiya rêber APO re. Rêheval Zîlan (Zeyneb Kinacî) çalakiya xwe ya leheng di herêma Dêrsimê de pêk anî û tektîk û asteke bilind ji berxwedana di pêvajoya nû de ji bo gerîla, gel û bi taybet ciwanên Kurdistanî derxist pêş, li aliyê din rênîşanên dorgirtina rêber APO û parastina rêber APO ya bi xeleka ji agir da pêşandan, her wiha ji şoreşa jin û çawaniya meşandina vê şoreşa mezin mesajeke diyar bû.

Piştî 27 salan di ser çalakiya fedayî ya şehîd Zîlan re derbas dibe şoreşa 19'ê Tîrmehê li ser bingeha binesaziya rêxistinî û idyolojîk a ku rêber APO di dirêjahiya 20 salên derbasbûyi de di dema mayîna xwe ya li Sûriye de ava kiriye de dest pê kir, vê şoreşê peyama xwe ji çalakiya şehîd Zîlan girtiye, her wiha şehîd Zîlan jî peyama xwe ji berxwedana 14'ê tîrmehê girtiye, divê li vir em bal bikşînin ser rola ciwanan di destpêkirina çirûska şoreşê de, roleke wê ya bingehîn di rêvebirina gel û Serhildanê li dijî rêtîma Baas a xwînmij hebû, ta ku navendênu ku di bin kontrola hikumeta xwînmij a Baas'ê desteser kirin, ne tenê ev hat kirin, heya parastina wan navandan jî kirin



**Salvegera 41'emîn ya greva mirinê yê 14'ê Tîrmehê 1982 li zindana Amedê**

*Divê ciwanên şoreşger di nava sînorênetewperest de nemînin, divê hemû ciwan û jinêni ciwan bikevin nava vê rêxistinê*



û ji girtîgehû binerdênu bûn cihêne işkence û girtinê veguherandin navendênu sivîlî û xizmetgehêne gel, bi destpêkirina êrîşen li ser

şoreşê re di salvegera xwe ya yekemîn de, tevgera ciwanê şoreşger li dijî van êrîşan bersiv dan û bûn hêza mertal a şoreşê.

Tevgera ciwanê şoreşger di rîya xwe rêxistin kirinê de pêvajoyeke girîng çêkir, bêguman çawa ku destpêka wê hebû, wê pêşerojeke wê ya ronîkirî jî çêbibe. Ji bo amadekirina şert û mercênu xwe derbasî her çalakiyekê dibûn, li ser bingeha vê rêxistinê ciwanan ji nû ve cihê xwe di hemû cure têkoşînan de girtin, li ser pêşxitina rê û rîbazên tekoşîna xwe xebitîn û bi pêşketina ku bi dest xistine karîbûn roleke mezin di firehkîrin û pêşxitina zanînê gel de bilîze. Şêwaz û terzê lehengiyê heya astekî bilind diyar bû, ta ku gihîşt asta fedatiyê jî. Li şûna wê sistemê weke hêzeke mezin, xwedî biryara mezin di refîn pêş de cih girtin û tevlî tekoşîna fedatiyê bûn. Tevgera ciwanê şoreşger a ku bi awayekî pir mezin pêş dikeve ew jî di nava vê tekoşînê de cih digire. Divê ev tevger pir çalak be. Divê ciwanê şoreşger di nava sînorênetewperest de nemînin, lê divê ji bo afirandina pêşeroja demokratîk û azad a ji hemû ciwanan û netewênen din re bixebeitin û divê hemû ciwan û jinêni ciwan bikevin nava vê rêxistinê. Divê ciwanê şoreşger bi awayekî mezin û aktîv bikevin nava tekoşîna rojane û divê koma ku hêza wê heye û êdî

xwedî zanebûne tekoşîneke mezin bike da ku bigihêje komên nû yên din jî û ji bo çêkirina rêxistineke mezin a ciwanan û danîna bingehekê di nava çalakiyan de û avakirina tevgereke mezintir û firehtir pêwîstî bi kedeke mezin heye.

Bi qasî ku xwe rêxistin bikin û ciwanan bi awayekî mezin tevlî tekoşîn û tevgerê bikin, ev ewqas bandorê çêdike û di nava komên gelên din de jî bandorê dike, ya ku pir zelale wê rê bide ku tevgereke gel a berfireh derkeve holê. Bi rêxistina ku wê di nava bingeha xwe de çêke û bi vê ve girêdayî jî divê ji bo rêxistinkirina komên gelên din û ji bo xistina wan nava tevgerê de kar were kirin, di vê mijarê de ciwan xwedî asteke bilind in, lê ya girîng ku tenê di vê astê de neyê sekinîn. Ji ber jîngeha ku em tê de ne, pir alîkar e. Lê ji aliyeke din ve dewleta tirk a faşîst a ku di piştî hilbijartinan di ber têkçûnê de jiyan dike, gefxwarinên şerê li ser herêmê nû dike û ji bo vê yekê giştî jî wê bersiv serhildan be, ango serhildana ku wê atmosferekî guncav ji demokrasiyê re ava bike û guhertina di asta bilind de bîne û wê bi xwe re vejîneke nû bîne, divê ev bi awayekî baş were naskirin û nirxandin, divê derfetên heyî bi awayekî baş werin bikaranîn. Hemû alî û rêxistinên wan, her wiha girseyên gelêrî yên berfireh ji bo derkevin qadan divê çi dikeve ser milên me em bi serkeftin û nêzîkiya rast pêk bînin, bi rastî mirov dikare pêvajo û şert û mercên heyî bi vê yekê binirxîne.

Di vê aliyê de û tiştê destpêkê ew e ku Rojhilata Navîn di nava tecrûbeke mezin de ye, tevgera jin di nava tecrûbeyeke cidî de ye û tevgera ciwanan jî di nava tecrûbeyekê de ye, ji ber ku tekoşîna azadî û demokrasiyê di nava xwe de hemû tecrûbe ezmûnan digire. Ji bo pêkanîna serkeftinê di vê tekoşînê de, divê hemû bi awayekî cidî bixebitin, divê ciwan

*Wê rol û armanca ciwanan çi be?*

*Ciwan çawa bi erk ku dikeve ser milên wan rabin?*

*Çawa bigihêjin asta tekoşîna qutbûnajî sistêmê?*



ji bo serkeftinê di vê tekoşînê de teqez bike, divê di nava kar û xebat de be. Bi taybet tekoşîna ku ciwanan di meşa azadî û demokrasiyê de kirine û dikin, divê vê karê pîroz bi ciwanan bidin nasîn. Ji bo xêzkirina xeta rêya pêşketinê demokratîk di Sûriye de û her wiha xêzkirina xeta hemû aliyan da ku bigihêjin rêverberiyekê demokratîk, ji vê re ciwanên ku wê bi karê xwe pêşketinê ava bike pêwîst dike, bi vê tekoşîna ku bi rêve birine, divê biryar her tim ji bo pêşketina ji bo demokrasiya Sûriye û hemû aliyên din be. Divê rola pêşeng a ku dikeve ser milê ciwanan ji bo pêkanîna serkeftinê di rêya azadî, demokrasî, wekhevî û dada (edalet) ji bo gelan û hemû mirovahiyê be.

Wê rol û armanca ciwanan çi be?

Di dema bê de, di aliyê karê ku li benda ciwanan e, ew pir girîng e, her wiha pêvajoya ku di pêşbîniyê de diyar dike ku rêya ku wê çareseriyê di pirsgirêkên pêşketinê de bîne tekoşîna ku tevgera ciwanan pê radibe ye, ji bo bi awayekî mezin ev tekoşîn bê bilindkirin û ji bo keda ku di berdêla gihadina astekê û derfetên tekoşînê bi awayekî mezin. Da ku tevgera ciwanan serkeftinê di tekoşîna pêşengtiyê de bilîze, divê bi awayekî rêxistinî yê domdar tevbigere. Ev rêxistin wê ji bo hemû ciwanên li giştî parçeyên Sûriye û nûnerên wan ên li derveyî welat kar bike û da ku tevgera ciwanan dihatir bi rêxistin û dîsîpilîn bibe û erka ku dikeve ser milê wê bi awayekî rast bike, wê serkeftina pêşketin, serxistin û îsrara di biryar, rêxistinê û şerê gelê şoreşgerî de bi ser bikeve,

*Perwerdeya rast zanîna rast a buyerên  
rojane û girêdana rast a bi pêşerojê ve ye.*



bêguman wê rê li pêsiya ciwanan bê vekirin û divê bi girîngî bal-darbûn li ser vê were sekinîn. Em jî di bawariyeke mezin de ne ku wê ev yek pêk bê, her wiha em ê berdevkên vê erkê bibînin û yên ku wê erka ku dikeve ser milê wan bi awayekî rast pêk bînin. Wê ciwan li qadêن tekoşîna me ya azadiyê kom bibin. Ciwan-êن şoreşger wê ji xwe de pêvajoya nûkirin û rêxistinkirinê dest pê bikin û wê bikevin nava peymanan û hevpeyman û çeperên tekoşînê li dijî dagirkeryê û faşîzmê bi tevgerên demokratîk û sosyalîst re bi awayekî domdar ava bike.

Di pêvajoya bê de, wê ciwan çawa bi erk û misyona ku dikeve ser milêن wan rabin û çawa bigihêjin asta tekoşîna qutbûna ji sîstemê?

Yek ji mijarêن ku divê em bi girîngî li ser rawestin perwerdeya ciwanan e, ger tevgera ciwanan bi awayekî rast hat perwerdeki-rin, wê rêxistina wê jî bi awayekî baş pêk bê, bi vî rengî sûdgirtina ji tecrûbeyên ku ji kadroyêن dagirtî girtine, wê demê wê ciwan bikaribin rast pêşengtiyê bikin. Tevgera ciwanan di heman demê de xwedî zanebûna mezin e û ew ê bi pêngavekê rabe û zanebûnê di nava hemû pêkhateyên civakêن din de belav bike. Bi vê armancê perwerdekirina ciwanan bi awayekî zindî xwedî girîngiyeyeke mezin e, mijara perwerdeyê cudahiyeke xwe ya din heye û divê li ser bê rawestandin û weke pirsgirêkeke pir girîng bê destgirtin û çareserî jê re bê dîtin. Heya niha di vê mijarê de hêzek di aliyê bîrdozî, xweperwerdekirin, lêkolîn û di vê aliyê de xwe kûrkirin derdikeve. Ji bo lêkolîn, horbînî û avêtina gava yekem di vê aliyê de û divê ji bo nirxan-din û komkirina wê di çêkirinê

*Ciwantî ne temen  
e, hest ye, psîkolojî  
ye, giyan e, fikir  
e, nêzîkbûn e,  
terzê jiyanê ye*



*Pencî salên tevgera  
Apogerî, rastîya veguhesina 40 mîlyon kes  
û bûyîna wê civakeke ciwan a hevgirtî ye*



de kar bê kirin û pêwîstî bi gavavêtineke bi hêz heye ku bigihêjîne pêvajoyeke nû. Perwerdeya rast zanîna rast a buyerên rojane û girêdana rast a bi pêşerojê ve ye. Perwerdekirina hestên me, fikrên me, pîskolojiya me û nêzîkatiya me li ser bingeha kûrkirina mezin di bûyerên rojane de bi awayekî giştî û rast wê bi rêya girêdana bi hêz û bi xurtbûna zanebûna dîrokî û pêşeroja bê pêk tê.

Ciwantî ne temen e, lê belê ernerjî ye, heste , psîkolojî ye, giyan e, fikir e, nêzîkbûn e û ew terzê jiyanê ye. Wateya xwe di taybetiyên serdemî de dibîne, divê bingeh bê girtin û pê re bê jîyîn û divê bibe yê hemû civakê. Şoreşa me li ser asta navnetewî şoreşa azadî û demokrasiyê ye, li ser asta civakî jî şoreşa me şoreşa azadkirina jinê ye. Avakirina civakeke ciwan pêwîst dike ku hemû pêkhateyên civakê azad bibin, pêncî sal ji dîroka tevgera apogeriyê ya ku civaka kurd ji rewşa ku li ser wê hatiye sepandin derxist, ev rastiya veguhesina 40 milyon kes û bûyîna wê civakeke ciwan a hevgirtî, ev bi awayekî serkeftî pêk hat. Civaka kurd di hemû parçeyên Kurdistanê û her çar aliyên cîhanê de weke vê heyecanê û kêfxwaşıya nûkirin û ciwantiyê de jiyan dike. Bi rêya jiyana rojane û bê berjewendî li hemû qadêن ku tê de tekoşîna azadiyê pêk hatiye pêşketin derdikeve û di her rojên ku dikevin atmosfera cejnan de hêvî û hestên mezin hene, ev yek di çekirina hewasên mezin ên tijî û girêdayî pêşerojê re derbas dibe, nûnertiya heyecana kêfxweşiya mirovahiyê dike. Civaka kurd yê ku bi rêya tekoşîna ku bi rêve biriye jiyaye, êdî bûye nûnerê ciwanan û wê berê pêşerojê yê nû ji hemû mirovahiyê re binexşîne.



## ŞEHÎD ÇEKDAR AMED



GERZAN EFRÎN

Hevalê Çekdar di sala 1990 de li Pasûra, navçeya Amedê, tê cîhanê. Civaka bi giştî girêdayî axa xwe ye, lê bi derketina PKK re, li ber pêşketina tekoşîna azadiyê Kurdistanê re, welatparêziyê astekî nû wergirtiye. Li hemberî dagirkeriyê faşîzmê wekî helwesta îsrara xwe bûyîne derketîye pêş. Gelek gund û bajarên Kurdistanê ji ber vê helwesta li ser xakê welatênen heyî nav pergala qirker qebûl nake. Bi zordariyê mezin re rû bi rû bûn. Pasûr jî ji destpêka tekoşîna azadiya Kurdistanê bûye cihekî welatparêzî û nûkirî, û bi dijwarî şer li dijî dewleta Tirk a dagirker çêbû, ku polîtikayêن taybet li ser vê herêmê meşand. Îro jî bi heman awayî dimeşîne, lê rihê berxwedêr giyanê jiyana azad hesiyane û bi tu awayî nehatine asteng kirin. Ji Pasûrê gelek lehengên hêja derketin li rûxandina pergala li ser hîmê qirkirina gelê kurd hatiye ava kirin de bûn xwedî pare.

**“ Pasûr jî ji destpêka tekoşîna azadiya  
Kurdistanê bûye cihekî welatparêzî ”**



Zarokatiya heval Çekdar li navingekî wiha derbas dibê. Di temenekî pir ciwan de diçe Îzmîra Tirkîyê û di karê avahî sazî û her wekî din de dixebite. Dixwaze têkiliya li derbara malbatê bike. Kesekî kedkare û bi coşê xwe tê hezkirin. Dûrketina ji welat, rastiya di dilê heval Çekdar de dûr naxe. Zilm ku li ser gel tê meşandin, tekoşîna ku li nav serê çiyayan ji hêla gerîlayan ve tê pêşxistin, dîlbûyina rêber Apo, şehadetên ku tênen jîn, di hizra heval Çekdar de pevçûnekî dijwar dije. Bi vê yekî beşdarî nav xebatê ciwanan dibe bi avêtina kevirekî, ji ber dixwaze hêrsa xwe ya li hemberî pergala qirker verşîne. Di sala 2009 an de biryar dide ku êdî wekî gerîlaye li bilindahiya çiyayan tekoşîna xwe bidomîne û beşdarî nava refên gerîla dibe. Navê xwe dike Sîpan Amed. Li Garê ezmûnê destpêka jiyanê gerîlatiyê werdigre û bi perwerdeyên ku dibîne di demek kurt de pêşketinên girîng dijî. Xwediyê avahiyên jîr, çalak û bi coşe, ji lewra di jiyanê de dibe xwediyê rol. Heta 2010'an li Garê xebatên xwe didomîne û hewl dide fêrî hemû hûrgûlî jiyana gerîla bibe. Di şerê ku li hemberî pergala qirker a dewleta Tirk tê dayîn de ser wextiyekê qezenc bike tekoşîneke serkeftî bi meşîne daxwaza wî ya çûyina eyaleta Erzirûmê her li pêse.

**“Dûrketina ji welat, rastiya di dilê  
heval Çekdar de dûr naxe”**





“ Giyanê heval Çekdar û  
yê hezaran fedayîyên  
din li rojava bûn  
bingehê pergala civakekî  
demokratîk û azad ”

Dema li Rojava û Sûriyê pêvajoya şoreşê destpê dike gelek hevalen bikaribin di pêşde birina şoreşê de rol bilîzin ji bo Rojava têv vehsaz kirin. Heval Çekdar jî di nav wan hevalan de ye. Xwesteka çûyina eyaleta Erzûrûmê dide aliyekî û bi heyecanekî mezin ber bi Rojava ve dikeve ser rê. Dema derbasî Rojava dibe navê xwe dike Çekdar Amed. Derbasî herêma Efrînê dibe di rêxistin kirin û perwerde kirina ciwanan de, di têgahandina rastiya bi şoreşa pêşbikeve de, encamên girîng diafirîne. Di sala 2012 an de bingehê şoreşa Rojava bi fedekariyek mezin êdî astek wergirtî ye. Rêjîma Baas, dewleta Tirk a dagirker û mêtîngerîya modernîteya kapîtalîzm ji vê pêşketina ku gelê kurd ava dike ketine nava fikaran. Ji lewra dest bi êrîşen tune kirina şoreşê kirin û çeteyên bi navê Artêşa Azad, El-Nûsra û hwd bi ser hêza xwe parastinê ya Rojava de şandin. Heval Çekdar bi şikandina van êrîşan xwedî rolek leheng bû jî. Gelê kurd tema jiyana azad wergirtiye, ji lewra ruxme hemû êrîşan jî, ji berxwedanê gav paşde navêje. Heval Çekdar dikeve destê dijmin, ku bi awayekî hovane îşkence dikin û bi vî awayê di meha Tîrmehê 2012 Şehîd dikevê. Li şoreşa Rojava her ku çû û mezin bû, giyanê heval Çekdar û bi hezaran fedayîyên din li Rojava bûn bingehê pergala civakekî demokratîk û azad.



## Girîngîya Çand û Ziman



EHMED HESEN  
MAMOSTEYÊ ZIMANA KURDÎ

Bi pênaseyekî sade ziman yek ji têgînên ragihandinê yên mirov e ku bi rêya wê danûstandina destpêkê di navbera mirov û mirov, mirov û ajal û mirov û civakê de dest pê kiriye û bi dûmana demê re pêşketiye. Di aliyê cûreyê de mirov dikare ziman bike du beş, zimanê devokî û zimanê nivîskî. Ya ku herî zêde mirov li ser biponije zimanê devokî ye, ji ber herî zêde mirov û komên destpêkê ev ziman bi kar anîne û ji wê bi

şûn de li ser kevir, dîwar, şikeft û kaxizên ku çêkirine nivîsîne.

Ziman di çarçoveyekî sade de çavkaniya ragihandina agahiyan û danûstandinê ye, nexasim civakê bêyî wê nasnameya xwe ji dest dayî ye, tê mêtin û li ber bayê asîmîlekîrinê dikeve, di bingeha her pêşketineke zanistî ya civakan de pêşxistina asta zimanê zikmakî derbasdar e, ji ber ziman ne tenê weke heyîn civakê dike hebûn, her wiha dike xwedî nasnameyeke netewî ya dest jê nayê berdan, li vir a ku mirov li ser biponije perwerdeya li ser zimanê zikmakî ango zimanê dayîkê ye, li cihê ku zarok dest bi lêvkirina tîpêñ zimanê xwe yê zikmakî dike li wir jî şoreşa zimên dest pê dike û diherike nava hûrgiliyêñ civakê, kengî ku ziman weke parçeyek ji nirxêñ civakê yên pîroz ku dev jê nayê berdan hate destgirtin û nirxandin, hingê mirov dikare li pêşketina asta wî zimanîbihizire. Gava ku rêber APO dibêje "ziman beden e, çand beden e, li bedena xwe xwedî derkevin" a rastî çavkaniya ku ziman civakan dike hêza hebûn û îradeyê raber dike, nexasim gava ku em ziman ji bo civaka kurd weke dergûşa azadî




û evînê pênase bikin, hingê wê dihatir rastir be, ji ber ku gelê kurd di nava pençên mêtîngerî û dagirkeryê de hewildanên xwedîderketina li ziman û çanda xwe gelekî zêde kirine û bûne sînor li ber têkçûna çand û zimanê xwe yên ku her gav hatine qedexekirin û di polîtikayên asîmîlekirin û qirkirinê re jî derbas bûne, heyâ roja îro jî herî zêde zimanê devokî li pêş maye, bi taybet bi derketina şoreşa Rojavayê Kurdistanê re careke din zindîbûneke bê hempa ya zimanê kurdî derket pêş, gelê kurd karîbû careke din di nava şopêن şoreşê de xwe li derdorî hînbûna zimanê kurdî bipêce û xwe zindî bike.

Ji ber bi awayekî bingehîn ziman têgîna sereke ya qada çandê ye, mirov dikare ziman weke çandê jî bide nasîn, çand jî weke cîhana maneyê ya civakan hemû heyîn û afirandinê ku di encama keda civakan a bi hezarê salan di dîrokê de derketine û derdi Kevin holê di nava xwe de hembêz dike. Civaka bêyî çand û ziman şansê wê yê azadiyê pir kême, ango ne dikare bibe xwedî hêza polîtîk a xwe rêvebirinê, ne jî xisleta wê ya parastina hebûna xwe pêş dikeve. Çand bi awayekî bingehîn binesaziya manewî, zanistî, wêjeyî û netewî ya civakan e, çand di bingeha xwe de weke dualî, em çandê weke çanda madî û çanda manewî bigirin dest, wê hêjayî gotinê be, hemû amûr û pêşketinêñ madî ku civakan di rêveçûyîna dîrokê de afirandine, navê çanda madî lê bar kirine, her wiha hemû aliyêñ manewî yên wêjeyî, çandî, dîrokî û hestiyarî ku civakan tê de zanîn û afirandinê xwe pêşxistine weke çanda manewî ji xwe re pejirandine.

Bi gelempêri çand û ziman hêzên maneyê yên pêşketina kom û civakan e, nasnameya civakan a jiyan û hebûnê ye.





## ROLA XWENDEKARAN DI ŞOREŞÊ DE



**EMÎNE MIHEMED**  
XWENDEKARA ZANÎNGEHA ROJAVA

Di nava rûpelên dîrokê de û heta roja me ya îro jî di nava her berxwedanî, raperîn û şoreşekê de her tim xwendekar bûne xwedî roleke cêwaz û her karîne di warê biryar dayînê de xwedî sekin bin, ji ber hêza vê beşa civakî rastî em dikarin weke hêzek taybet bigrin dest. Him di aliyê feraset hem jî di aliyê fîzîkî de...ku her du alî hev du temam dikan. Her ku mirov karibe xwe di warê îdiyolojî de zane, berfireh û kurtir

bike her ku diçe hêza fîzîkî jî dibe alîkar da ku ev herkîna fikrandinê bikeve xizmeta tiştên erênî û baş. Gelek mînakêن şoreşenê cîhanî hene ku xwendekaran hêza xwe tê de aktîf kirine û di gelek beşên kar ên girîng de rol girtine.

Her wiha wek gelê kurd jî em karibin bigrin dest di nava hemû serhildan û şoreşenê ku rabûne tişta ku bal dikşîne ew e ku dîsa jî

***Di nava her berxwedanî, raperîn û şoreşekê de***

***her tim xwendekar bûne xwedî roleke***

xwendekaran cihê xwe tê de girtin ango em dikarin wiha binirxînin ku kesên bi rakirina şoreşê radibûn ji xwe xwendekar bûn. Mînaka wê ya berbiçav jî şoreşa Rojavayê Kurdistanê ye a ku tê de xwendekaran karîbûn xwe bi rêxistin bikirana û xwedî li kurdiyeta xwe, nasnameya xwe ya ku bi hezaran salan hatibû windakirin karîbûn ku bidestbixin û gelek gavêن mezin bavêjin di vê pêvajoya zehmet. Xendekaran him bi erkê xwe yî kar hem jî bi erka xwe ya xwendinê radibin ya ku vê yekê jî îsbat dike di nava ewqas zext û êrîşen dewleta tirk de, xwendekaran her karîbûn sîstema xwe jî di nava dibistan û zanîngehan de bidin rûnişkandin, hem jî karîbûn bi awayekî pir zana xwendekarên dîtir birêxistin bikin. Ev dibe sedem ku xwendekar hêdî hêdî hewl didin ku li rastiya xwe bigerin, cewherê xwe nasbikin. Her wiha bi zanebûna destxistî dikarin ji bo pirsgirêkên gelê kurd bibin hêza çareseriyê. Ev bi tena ser xwe serkeftineke. Di van salên taliyê de xwendekaran bi gelek çalakiyan rabûn, him di warê îfadekirina xwe, hem jî di aliyê moral dayînê de ci bi réya şahiyêن cur be cur dibe, ci ji aliyê festivalê salane dibe. Ev yek didê îspat kirin ku xwendkar jî xwedî hêzeke têrkere ku dikare li beramberî dijmin şer bike û rastiya gelê kurd bi nêrîna wê ya rast bi tevahî cîhanê bide naskirin.



*bi gelek çalakiyan rabûn*

XWEDAWENDÊN

AZADIYÊ

## YÊN KU XWEDÎ ÎDAYA JIYANA MEZIN Û BI WATE



VIYAN SERHED

xwe yê şerê taybet, bi dagirkirina çand û ziman, bê ser û şun hîşti-nan ve bi ser me de hatin. Ji ber ku dijmin bûn dijî me, dijî çanda me, dijî hebûna me bûn. Em kurdên ku xwedî çanda dayîkê hevparî û mirovahîyê bûn. Em kurdbûn, nebîyên Şêx Seîd, Seyît Riza, zarokên Zarîfe û Elîşêr bûn. Lê em tirsîya bûn pêşengên me nemabûn, lê dîsa jî wekî her zarokek kurd em xwedî xeyalê Azadîyê bûn. Em êdî biçuk bibûn em hatin çar parçekirin, bi sîyasetê bişavtinê em hurik bûn û tenê bûn malbat. Ji çanda dayîkê dûr ketin û em bûn kole, tune hatin hesibandin, em bûn Îran, Suriye, Tirkîye û Iraq. Dayîkê me di çîrokê xwe de digotin em kurdê erebin, kurdê tirkin, kurdê

Destpêka, dîroka her gelî, her netewî heye lê em wek kurd di kuderê de di kîjan dest-pêkê de bûn? Gelo em di kuderê de hati-bûn fetisandin? Di kîjan kêlîyê de ji me re gotin hunê xwe tune bihesibînin! Di Dersîm de çemê Munzur sor herikî, gelîyê Zîlan nav guherî bû newala kuştîyan, di Helepçe de laşê zarokan di destê dayîkê wan de helîyan. Bi tang û topêx xwe, bi mektebê

farsin. Em hatibûn elimandin ku ji bo ku em jiyan bikin emê bêdeng bibin. Tarîtiya ku li ser me bû, bi derketina Rêber APO ronî bu. Di serdemeye ku kesekî nikaribu bigota ez kurdim da Rêber APO got Kurdistan hatîye dagirkirin û dest bi serdemeye nu kir. Kesekî bawer nedikir ku dara hişk nuda şîn bibe lê belê şîn bû, ji ber ku Rêber APO dibêje min tu carî xîyanet li xeyalên xwe yê zaroktîyê nekir. Di heft salîya xwe de dest bi dahurandina koletîya ku hatîye ferzkirin kir. Ne ferzkirinê dayîka xwe ne yê civakê ne jî yê dewletê qebul nekir. Ji jiyanê re got ey jiyan yan ezê te azad jiyan bikim yan jî ezê te ji jiyanê nehesibînim. Wê demê wek kurd em şîyar bûn û me zanî ku ji bo ku em jiyan bikin û ji jiyanê re bêjin navê te jiyane divê em şer bikin heyâ ku bi serkevin. Rêbertîya me wê demê dest bi tekoşîneke bê nefes kir, ji bo me bû roj, wê demê me wek kurd berê xwe da roja xwe, berê xwe da çand, ziman û hebûna xwe, berê xwe da sebebê jiyana xwe. Bi taybetî wek jin, Rêber APO bû sebebe jiyankirina me em wek jin bûn xwedî idaya jiyana mezin û wate. Giştî jin di PKK de bûn yek, bûn xwedî nasname, îrade û hebûn. Ji bo wê yekê Partîya Karkerê Kurdistan bû Partîya Fedaîyan. Ji ber ku Rêbertîya me herî zêde giringî da hevaltîyê di zarokatîya xwe da, gotibu ezê bi xwe hevalê xwe ava bikim, gerduna hevaltîyê PKK avakir û got ezê bibim hevalê herî baş yê jin. Yê ku xwestin roja me tarî bikin, me ji ron-ahîya me durxin, bersiva herî dijwar girtin. Bingeha PKK hevaltîye, ji bo vê yekê Ş.Zîlan beranberî êrîşê dijmin yê dijî Serokatîya me bi




*"Wê demê wek kurd em şîyar bûn û me zanî ku ji bo ku em jiyan bikin û ji jîyanê re bêjin navê te jîyanê divê em şer bikin heyâ ku bi serkevin."*



*Ş.Ruken û Ş.Sara  
careke din weke  
Ş.Zîlan tirs û  
xofeke mezin  
kirin dilê dijmin.*

çalakîya xwe bû tirs û xofa dijmin, ji bo me giştîyan bû xeta rêhev-altîya rast ya bi Serokatî re, ji ber ku Ş. Zîlan di nameya xwe de dibêje xwezî ji canê min zêdetir tiştek hebuya û min feda bikira. Rêber APO ji bo Ş. Zîlan dibêje manîfestoya jiyanê ji ber ku heval Zîlan bû ku ji Rêber APO, PKK femkiribu. Ji bo wê yekê bû fedayî, bû xeta birdozîya azadîya jin. Ruxmê ku heval Zîlan salek bû tevlê partiyê bûbû, ya ku Serok APO fêmkir û pêkanî ew bû. Ji bo însan tiştê herî bi qîmet canê wî ye di vê rîyê de tu dixwazî ji canê xwe zêdetir çi hebe bidî. Heqîqeta hevaltîya PKK, rihê APOÇÎYAN rihê fedayî ye, her şehadetek dibe derketin û nubûnek, jiyanek. Di oxira gel, welat û hevaltîye de tu dibî fedayî, ji bo wê jiyan tu carî ranaweste û bi dawî nabe, ji bo wê bi hezaran jin hatin û bûn Zîlan. Rêber APO hevaltî kire rihê berxwedanê. Lê belê ji ber hevaltîya me ya kêm, Rêber APO hat girtin û niha di bin tecrîde ke girankirî da ye. Bi ketina sala 2023 ev bû 25 sal Serok APO di Imraliyê de ye. Bi girtina Rêbertî hemû kes fikirî ku her tişt xilas bû, lê belê Rêber APO dojeha Imralî kire mektebek û 24 saetan bê navber nefes bi nefes tekoşîn dike û ji bo me hemûyan dibe nefesek. Lê belê em bi giştî nebûn nefesek ji bo Rêber APO. Şehîd Zîlan di nameya xwe de dibêje ez dixwazim bibim xwedî jiyanek bi wate, çalekiyek mezin, yanî ya ku jiyanê bi wate dike gihiştina heqîqeta Rêber APO ye, ji wê heqîqetê para xwe

girtine ev dibe çalakîya herî bi wate ku jiyanekê îdayê wê hîn bilindir bi xwe re tîne. Keda Rêber APO ya 50 salî gelê kurd kir pêşengê hemû gelan. Gelekî di rewşa tinebûnê de derket û bû hebûn. Ji bo wê jî Rêber APO dibêje gelê kurd ne di rewşa zayîn an jî hişyarbûnê de ye, gelê kurd di rewşeke di azadîyê de israrkirinê de ye. Îro hemû gel, hemû beşen civakê xwe di Rêber APO de dibînin. Gerîlla xelekek agirê derdora Rêber APO ye. Ji bo bê hêvî xistin û bê bandor hîştinê dijmin bi giştî hêza xwe ya teknîk, gazên kîmyasal ve dixwaze vê xeleka agir bişkîne, lê belê di şexsê xwedavendê azadîyê H. Rûken û H. Sara de dîsa dubare derket holê ku dijmin bixwaze bi vî rengî êrîş bike teknîka xwe bawer be wê poşman bibe. Rêber APO dibêje teknîka herî mezin însane. Fedayîyên Rêber APO îrade û hêza xwe ji Rêbertîya xwe girtine ji pola ne. Ş. Ruken û Ş. Sara careke din




*"Keda Rêber APO ya  
50 salî gelê kurd kir  
pêşengê hemû gelan"*

weke Ş. Zîlan tirs û xofeke mezin kirin dilê dijmin. Du jinêñ leheng yek ji Bakûr yek ji Rojava bi vîn û bawerîya hevaltîyê destê xwe dane hev û xwe di mîjîyê dijmin de fecirandin. Ew bûn berdewamîya xeta Zîlan, ew bûn xwedavendê azadîyê, ew bûn xeta demê, ew bûn pêşengê sedsala jin, sedsalâ 21'ê. Ji bo hemû kesî bûne pîvanê tevlîbûna vê sedsalê. Beranberî elimandin û êrîşen dijmin xelaka agir ya derdorê Serok APO xwertkirin û ji bo hemû kesî bûne xeta di azadîyê de israrkirinê. Ew bûn yên ku xwedî îdaya jiyana mezin û bi wate. Ji bo me hemû yan bi taybetî ciwanan xeta ku em beranberî wê xwe bigrin dest û ji bo me pîvanê tevlîbûna pêvajoyê ye xeta Zîlan, Rûken û Sara'ya ne. Tenê wê demê em dikarin bibin layîqê keda Rêber APO û Fedayîyan.



## Ji Almanya heyâ çiyayên Kurdistanê

*Jakob Riemer, bi navê hereketê Şiyar Gabar, di salê 2013 de ji Almanya tevlî nava rafên PKK bûyê û di meha Tirmehê salê 2018 de li hemberî dagirekeriya Tirk li çiyayê Çarcella şehîd ket.*



ŞİYAR GABAR


PKK jî nas kir.

Hîn di dest pê kê de dema ez 13, 14 salî bûm, her tim nakokîyan min hebûn. Ez çawa jiyan bikim? Min li derdora xwe mêze kir û min dît ku însan jiyanekî pir vala, bê mane jiyan dikin, weke robot jiyan dikin. Naveroka xwe kirin firotin. Min her tim ji xwe re got: Ez nikarim jiyanekî wisa qabul bikim. Min got: Ez nikarim bê edaletîye di cîhanê

Navê min Şiyar Gabar e. Ez di 10'ê Cotmehê 1994 de li Hamburg, Almanya, ji dayik bûm. Malbata min demokrat e. Min berî di nav tevgerên çepgerên Almanya de cih girt û her tim ez di lêgerîna de bûm. Ez geriyam, min got: Li kû derê di cîhanê de tevgerên sosyalîst hene, li ku derê şoreş çêdibin... û wisa ser internet min ser şoreşa Rojava bi-hîst û ji vê ez pir bi bandor bûm. Wisa min

de qabul bikim û ez mecbur im bi awayekî tekoşîn bimeşînim. Wisa ez tevlî nav refêن çepgerên Almanya bûm. Ama piştî demekî min fêm kir ku çepgerên Almanya di pratîka xwe de pir oportûnîst jiyan dîkin: Tenê di teorîyê de sosyalîst in, û hinek însan jî di pratîka xwe de jî, ama ne di astekî de ku bikaribin şoreşekî serbixin û ji sîstema kapîtalîst re bibin bersiv, ji bê edaletî re, ji desthilatdarî re bibin bersiv. Ne di wê astê de ye. Ez her tim di lêgerîna de bûm: Ez çawa dikarim teorîya xwe û jiyana xwe bikim yek. Min got eger ez dibêjîm ku ez dixwazim ji bo sosyalîzm şer bikim, ji bo cîhanekî din şer bikim, ji bo azadî ez dixwazim şer bikim, ez her tim di lêgerîna de bûm: Ez çawa dikarim vê di jiyana xwe de pêk bînim. Di vê lêgerînê de min PKK nas kir. Tiştê ku herî zêde ser min bandor kir yekîtiya pratîk û teorî bû. Eger tu bixwazî jiyaneke azad, jiyaneke wekhev, sîstemekî alternatif ava bikî, di dest pê kê de mecbur e tu di jiyana xwe de van tiştan pêk bînî, di şexsê xwe de, di kesayeta xwe de azadî û wekhevî bide runiştandin. Ew her tim min bandor kir, fedekartîya wî. Her mîlîtanekî PKK, her gerîlayekî xwe bi cana xwe, bi her tiştên xwe fedâ dike ji bo azadî. Ji bo gel jiyana xwe fedâ dike. Ew her tim ser min bandorekî pir mezin kir. Ew însan çawa ewqas cesaretlî dîbin?

Tiştê ku herî zêde bala min dikişand? Hêdî min pirtûkên Serokatî jî xwend û hêdî jî pir nakokîyan û pirsan ku berî ez nikarîbûm bersiv bidim, hêdî min bersiva wî dît. Di vê milî de bandorekî pir mezin ser min çekir. Her ku dicû û her ku min îdeolojiyê nas kir ez dikarîbûm jiyana xwe yê kevn tehlîl bikim, malbata xwe tehlîl bikim, civaka ez tê



**Jiyaneke ser  
van ciyayêن,  
bê îmkan, di  
zehmetîyan de  
herî zêde mirov  
azadîyê hîs dike.**

